

Nimêj û ragihandin

Ez spasiya te dikim ey xwedayê min ê asîmanî ji ber ku ez bi awayekî baş hatime afirandin, ji ber ku te ez afirandim. Ez te spas dikim ji ber ku te ji min hez kir û vexwendim daku ez ji te bim. Ez te spas dikim ji ber peyrewbûna Îsayê Mesîhî.

Min bibexîşîne ji ber ku ez bi hestên bilindbûnê kêfxweş bûm. Ez vê daxwazê bi temamî red û înkâr dikim. Ez kêfxweşiya ji ber çêtirbûna ji kesên din înkâr dikim. Ez bi şaşbûna xwe diaşêrim. Wek hemî xelkê, eger tu ne bi min re bî ez nikarim tiştêkî bikim.

Herwiha ez tevlîbûna miletê herî çê înkâr û tobe dikim, yan nijada herî baş. Ez pesind dikim ku hemî mirov li hizûra te wekhev in.

Ez ji ber gotinên ku kesên derdora min biçûk kirine, û wan bi redkirinê hîskirin dane, tobe dikim, û bexîşîna ji bo her peyveke ku devê min derketiye, dixwazim.

Ez fikira ku milet li gor nijada xwe, netewa wan, xizaniya wan yan asta xwendina wan tên nirxandin, bi carekê red dikim.

Ez dizanim ku tenê bi n'îmeta xwedê li hizûra te disekinim. Ji hemî yasayên mirovan dûr dikevim, û tenê li te dinêrim daku tu min xelas bikî.

Bi taybetî ez mafên ji ber fêrkirina ku bawermendên musliman ji hemî mirovan çêtir in, û ew ê bi ser bikevin, derketine, înkâr dikim.

Ez mafên ji ber baweriya ku mêr ji jinan çêtir in, bi temamî înkâr dikim.

Bavê min ê asîmanî li min her hestek bi bilindbûn û çêtirbûnê tobe be, ez ê wan bi xulamtiya xwe ji te re biguhêrim.

Ey xwedê, ez hildibijêrim ku ji serkeftina xelkê re şa bibim. Ez dexesî û çavnebariyê bi temamî înkâr dikim.

Ey xwedê hukmeke dirust û sax li ser asta min di xwe de, bide. Min bi rastiya nêrîna xwe ji min re agahdar bike. Min fêr bike ku ez bi kesayeta xwe ya ku te di min de afirandiye, razî bim.